



KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

## **ANALÎZA ROMANA**

# ***BEXTIYAR ELÎ APÊ MIN CEMŞÎD XAN KU HERTIM BÊ EW LI BER XWE DIBIR***

Mariye YAŞAR BUDAK

13721170

Şêwirmend

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2018

KT

Zaningeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

## **ANALÎZA ROMANA**

# ***BEXTÎYAR ELÎ APÊ MIN CEMŞÎD XAN KU HERTIM BÊ EW LI BER XWE DIBIR***

Mariye YAŞAR BUDAK

13721170

Şêwirmend

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2018

## KURTE

Realîzma efsûnî bi taybetmendî di sedsala 20.an de li Latîn Amerîkayê bişekil bûye û pêş ketiye. Sînorên vê têgehê ne teqez in. Ev rewş jî behremeke ku hêmanên fantastîk û sersirûştî bihewîne dibe ku ji hêla realîzma efsûnî bê nîrxandin. Taybetmendiya realîzma efsûnî ya herî mezin ew e ku bi hev re dana ya serûştî û ya serserûştî ye. Herwiha ev jî alî xwendevanan wek tiştêkî asayî tê dîtin. Di realîzma efsûnî de bûyer hertim deraqilî be jî cîh hertim ji dinyaya tiştêyî ye. Ev têgeh jî bo romana wêjeya kurdî ya nûjen ne kevna e. Di vê mijarê de wek mînak romana “Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir” e.

Bextiyar Elî yek ji nivîskarên hêja ya wêjeya kurdî ya nûjen û ronakbîrêkî kurdan e. Nêzîkî 20 berhemên wî hene ku bi zaravayê soranî nivîsiye. Bi nivîsîna helbestan dest bi karê wêjeyî kiribe jî bi romanên xwe navdar bûye û di dilê xwendevanan de cihêkî bilind girtiye. Me jî xwest ku em ji romanek wî ya bi navê berhama “Apê min Cemşîd Xan ku bê ew hertim li ber xwe dibir” ji aliyê mijar, leheng, cih û war û honanadîna romanê li gorî realîzma efsûnî û qaîdeyên wê binîrxînin. Armanca xebata me ev pêk tîne.

**Bêjeyên sereke:** Bextiyar Elî, Apê min Cemşîd Xan ku bê ew hertim li ber xwe dibir, realîzma efsûnî, roman.

## ÖZET

Büyülü gerçekçilik 20.da Latin Amerikada şekil alıp gelişmiştir. Bu akımın sınırları belirgin değildir. Bu durum gerçek ve gerçeküstü öğeler içeren bir eserin büyülü gerçekçilik akımı çerçevesinde değerlendirilmesini sağlar. Büyülü gerçekçiliğin en önemli özelliği gerçek ve fantastik öğeleri bir arada sunması ve bu durumun okuyucu tarafından garipsenmemesi, olağanmış gibi karşılanmasıdır. Büyülü gerçekçilikte olaylar olağanüstü olsa da yer, zaman ve karakterler gerçek dünyadandır. Büyülü gerçekçilik akımı modern kürd edebiyatında çok da eski değildir. Bu bağlamda Bahtiyar Ali'nin eseri olan “Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir” romanını önemli bir örnektir.

Bextiyar Elî modern kürd edebiyatının sorani lehçesiyle yazan 20'ye yakın eseri bulunan değerli bir yazarı ve makale ve raporlarıyla entellektüel yönünü gösteren bir kürd aydınıdır. Şiirle başladığı edebiyat hayatında asıl ününü romanla yakalamıştır. Çalışmanın amacı büyülü gerçekçiliği romanlarında büyük bir ustalıklarla kullanan Bahtiyar Ali'nin romanı olan “Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir” yer, zaman, karakter, olay ve kurgu açısından değerlendirmek oluşturuyor.

**Anahtar sözcükler:** Bahtiyar Ali, *Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir*, büyülü gerçekçilik, roman.

# NAVEROK

NAVEROK .....	I
ÖZET.....	II
KURTE .....	I
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEM

### JİYANA BEXTIYAR ELÎ Û BERHEMÊN WÎ

1.1. JİYANA BEXTIYAR ELÎ .....	5
1.2. BERHEMÊN BEXTIYAR ELÎ.....	6

## BEŞA DUYEM

### ANALÎZA ROMANÊ

2.1. <i>APÊ MIN CEMŞÎD XAN KU HERTIM BÊ EW LI BER XWE DIBIR</i> .....	7
2.2. BI CEMŞÎD XAN RE LI MEYDANÊN ŞER .....	8
2.3. XEFGEHÊN BARANOK .....	9
2.4. VEGERA LI BAJÊR.....	9
2.5. CEMŞÎD XAN Û XWEDÊ .....	10
2.6. RÊWÎTIYÊN CEMŞÎD XAN .....	10
2.7. AJANSA CEMŞÎD XAN .....	11
2.8. DAWÎYA CEMŞÎD XAN.....	11
ENCAM.....	12
ÇAVKANÎ.....	13

## DESTPÊK

Realîzma efsûnî; rêbaza hunerê ye ku di hundurê xwe de hemanên bisihir /biefsûn dihewîne herweha ya ku xeyalî/dererastî û rasteqînî bi hev re girêdide.

Bi şîroveya David Punter merev dikare werê daxuyan bike: “ Ger xeyaletê li maseya we ya taştê rûnê û hûn ji tirsan biqutifin ev tirse w ê tiştêkî fantastîk be. Lê belê, ku hûn bêjin “ Xeyaletê, ka wê riçalê dirêjî min bik.” Ew ê bibe realîzma efsûnî. Piştî ku hûn werê bêjin xeyalet, ku bêje “ Dapîra min rîçaleke pîvazan çêdikir, hew dibû. “ ;hûn jî li hemberî vê peyvê ku hûn bêjin “ tewşo mewşo nepeyiv, rîçala pîvazan çênabe.” Ev ew ê bibe realîzma efsûnî. (<http://www.leblebitozu.com/buyulu-gercekcilik-eserleri-ve-alintilari>)

Reazlîzma efsûnî, hêmanên rastîqîniyê ya xeyalî bikar tîne. Bûyerên dererastî wek tiştên gelek ji rêzê û xwezayî bi gunedêriyeke tê vegotin. Ya rastîqîn û ya xeyalî tîcîm hev û tevî hev dibin. Çi tiştên balkêş hebin giş dibin tiştên ji rêzê. Derasayî û rasteqînî dikevin çarçoveyekê. Yek ji ya din ne çêtir yan jî xerabtir e. Ya rast û ya biefsûn bi ahengeke xwezayî dibin yekperçe. Hewlêdana vebêj ya ji bo daxuyankirina bûyeran ew ê deriyê pirsyariyê veke. Bi listikên ziman xeyal û rasteqînî di metnan de bêtir diyar dike. Di zimanê realîzma efsûnî de derbirinên mecaz cihekî fireh digre; herwiha zimanek resen tê bikaranîn.

Têgiha realîzma efsûnî, cara ewil li Elmanyayê ji aliyê rexnegirê alman ê hunerê Franz Roh di sala 1925’an de di resimê de bi armanca danasîn û vegotina berhemên ku mijar û temayên xeyalî, dererastî û fantastîk bikaraniye. Ev bûye piştgiriya aresteyeke nuh. Bi vê tégehê wi taybetmendiyên ve aresteya nu destnişan kir. Digel ku ev tégeh ji qada wêjeyê, bi taybeti ji bo romanê di serî de ji aliyê nivîskarê Îtalî Massimo Bontempelli u di berhemên romanusên wek Borges, Fuentes u Garcia Marguez hate bikaranîn.

Realîzma efsûnî di sedsala 20.de bi postmodernizmê hevkarî kiriye. Realizma efsûnî ji raboriyê de di berhemên folklorîk de hertim hebû. Bi binavkirina wê cardin

bi ruh hat ev rêbaz. Em ne tenê di wêjeyê li şewaza realîzma efsûnî dibin, di serî de resim û mîmarîyê de û di her beşên hunerê wekî din de lê rast tên.

Berhemên realîzma efsûnî, bûyerên bisehr, derhoze, wendabûnên ji nişka ve çîrokên balkêş û dererastî di xwe de dihewîne. Di van sihran de wek ku bi sihrekê tiştêk bûye lê belê di realîzma efsûnî de ev tiştên ecêb wek ku ne ecêb be çêdibe.

Realîzma efsûnî bi rasteqînî, surrealîzm û bi fantastîkê tê girêdan lê belê bi rasteqînî, surrealîzm û fantastîkê ne heman tişt e. Realîzma efsûnî rasteqînîya ku di nav xeyalan de rêvîtiyê dike. Rasteqînî cih nade dererastîyan lê realîzma efsûnî cih dide herdûya û herduyan dike yek. (Özsevgeç, 2015: 190) Ji fantastîk û surrealîzmê cudabûna realîzma efsûnî ev e ku mirovan ji raboriya wan qut nake. Berhemên fantastîk ji rasteqînîyê pir dûr in. Di realîzma efsûnî de him taybetmendiyan rasteqînîyê him jî taybetmendiyan fantastîkê dihewe.

Wek ku Walter îfade kiriye; tiştên dererastî û tiştên ku ne di kontrola mirovan de ye divê merev mezin neke û wek ku gelekî asayî be xuya dike. Di berhemê de xwendevan dibe hêmaneke berhemê û vê rewşê pirsîyar nake. Lewra di navbera a biefsûn û a rasteqîn divê ahengek hebe. Nivîskar bi devgirtîbûnekê tenê bûyeran temaşe dike. Ji bo ahenga di navbera a biefsûn û rasteqîn xeranebe nivîskar jî xwendevan jî ew ê pir balder be. Ev taybetmendiya realîzma efsûnî taybetmendiya herî mezin e ji bo cudakirina ji beşên wêjeyê. Vebêj, divê di statuya temaşevanekî de be. (Özsevgeç, 2015: 191)

Taybetmendiyeke girîng ya realîzma efsûnî jî ji berk u efsûn û rasteqînê vedibêje melezbûn e. Di çîrokan de dijîtiyên weke baş-xerab, melayiket-şeytan, jin-zilam, spi-reş, bajarî-gundî pir tê dîtin. Divê nivîskar bi qasî hev behsa van dijîtiya bike. Bi gotineka din jî divê behsa bajarî û gundî bi hev re bike. Wext û cîh jî melez e di realîzma efsûnî de. (Özsevgeç, 2015: 192).

Di berhemên realîzma efsûnî de cîhên ji rêzê û karakter bi bûyerên dererastî re dikeve nav hev û ahengeke xweş pêk tîne. Realîzma efsûnî tecrubeyên ramanan venabêje. Ji dêvila veya tiştên ku di dinya me dene yê tiştêyî di rasteqîneke cuda de bikartîne. Ev jî wek ji dinyaya me be tê îfadekirin û merev werê hîs dike.

Dema ku merev behreme ke bi vî awayî hatiye avakirin dixwîne merev nikare metnan bi rêbazên xwezayê daxuyan bike. Li gor nivîsan tiştên sersîrûştî weke tiştên siruştî ne. Karakterên di berhemê de derbasdibin li hemberî buyerên ecêb ji dêvila bi matmayîn, tirs û ken bertek bidin wek ku her tişt pir asayî be temaşê dikin. Veya jî bi xwendevanan dibe ku pir ecêb an jî pêkenok were.

Di wêjeya Kurdi de şopa realîzma efsûnî di pirtukên Bextiyar Elî u Helim Yusif tê ditin. Bêguman herdû nivîskar û romanusên me bi serkeftineke mezin realîzma efsûnî di behremên xwe de dineqîşînin. Helîm yûsiv bi navê “Soberto” û bi navê “Mêrê avis” du pirtukan de realîzma efsûnî bikaraniye. Bextiyar Elî bi navê “Qesra balindeyên xemgîn” , “Êvara perwaneyê” û pirtuka ku em li ser dixebitin bi navê “ Apê min Cemşid xan ku hertim bê li ber xwe dibir” de realîzma efsûnî bikaraniye.

Di romanên efsûnî-realîst En Bextiyar Elî de, bi riya gelek referansên civakî, dîrokî û siyasî mirov dikare bi hêsanî pesind bike ku hûnandina berhemên wî bi realîteya Kurdistanê ve girêdayî ye. Romanên Bextiyar Elî, li dinyayên ku ji alî xwendevan ve wek ên rasteqîn tînin, derbas dibe. Ev rastiya ku, berî xwendevanan biheyirîne û baweriya wan a bi aliyên din ê realîst yên romanên bide wendakirin, di romanên wî de hêmanên ku ji qanûnên teb’î diborin hene, romanên wî dikin mînakên nimûneyî yên realîzma efsûnî. Di romanên Bextiyar Elî de dema hevsengiya di navbera bûyerên siruştî û sersîrûştî tînin raçavkirin, a ku li dinya wan serdestiyê dike şiyaniyê ye. Romanên Bextiyar Elî ji nêz ve bê xwendin, tê ditin ku di dinya wan de rasteqînî û efsûnî bi hevdû re ne û hêmanên efsûnî bi karîgerî hevkarîya ronîbûna şiyaniyê û deraqiliyê dike. Romanên Bextiyar Elî, bi tîkîlek zelal ya şiyaniyê û hêmanên fantastîk, alîkariya aşînakirina bûyerên jê nayên bawer kirin û realîteyên civaka kurdî dike. Bi rastî dîroka kurdan a modern tîjî paradoks û bûyerên nemimkûn in ku udi romanên Bextiyar Elî de tînin teswîr kirin. Bextiyar Elî, wek nivîskarekî kulî Kurdîstana Iraqê zahmediyên kurdan tecrube kiriye û wek çavdereki rewşa kurdan a di dema zalimiya Saddam Husên û êrişên Enfalê de, sedemên wî biheq hene ku realîzma efsûniyê ji bo nivîskariya xwe wek şeweyek wêjeyî bikar bîne.

Realîzma efsûnî ne bi rûyekî ye. Realîzma efsûnî rêbazên ku di xwendinên mirov di raboriyê de xwendine xera dike û bi dijîtiya bûyerên dinyayekdinê bi merev dide tecrubekirin. Ev cûre ji cûreyên romanên bi taybetmendiyên tund ji hev vediqete. Bûyerên di cûreyên din de ne qewimin di vê cûreyê de diqewimin û tiştên li dijî hev, tevhevdibin-dibin yek. Ji ber vê yekê dikare gelek cûreyên romana rexne bike.

## BEŞA YEKEM

### JIYANA BEXTIYAR ELÎ Û BERHEMÊN WÎ

#### 1.1. JIYANA BEXTIYAR ELÎ

Romannivîs, helbestvan û ronakbîrekî kurd û yek ji damezrênerên kovara Rehend e. Yekemîn romana wî bi navê Mergî Taqaney Duwem (Mirina Tekaneyê Duyem), di sala 1997an de li Swêdê hat weşandin. Bextiyar Elî, li bajarê Silêmaniyê li Başûrê Kurdistanê di sala 1960an de ji dayik bûye. Li Silêmaniyê xwendina seretayî li dibistana Şêx Selam qedandiye, dû re li dibistana navendî ya Ezmir xwendiyê, qonaxa amadeyî jî li dibistana amadeyî ya Helkewt xilas kiriye. Li zanîngeha Silêmaniyê û pişt re Hewlêrê, di fakulteya zanistî ya zanîngeha Selahedîn di beşê zevînasî Jeolojî de xwendekar bû, lê xwendina xwe ya zanîngehê xilas nekir.

Di sala 1983an de, di xwepêşandanên zanîngehê de birîndar dibe, dev ji zanîngehê berdide û ji wê salê bi şûn de bi tevahî xwe ji bo karê edebiyatê terxan dike. Kevintirîn berhema wî ya belavkirî ku di sala 1983an de nivîsandiye helbesta Niştiman e ku piştî 9 salan di dîwana Guneh û Karneval de tê çapkirin. Di rojên destpêka serhildana 1991an de, bi çend nivîskarên din re hejmareke kovara Azadî ku pênc hejmar jê derdikevin, belav dike. Di sala 1992an de yekemîn dîwana xwe bi awayekî sade û seretayî û bi tîrajeke kêr çap dike. Di navbera salên 1992-1994an de, hejmareke zêde ya panel û semîneran li Hewlêr û Silêmaniyê pêşkêş dike. Di salên 80yan de, Bextiyar Elî hejmareke helbestên dirêj dinivîse, weke “bajar”, “guneh”, “karneval” û çend helbestên din. Destnivîsa yekem a romana Mirina Tekane ya Duyem jî vedigere wê heyamê. Di payiza sala 1989an de, gotara xwe ya yekem di rojnameya paşkoya Iraqê de belav dike. Piştî derketina şerê navxwe di Îlona 1994an de, ji Kurdistanê bar dike û berê xwe dide Sûriyê, piştî neh mehan ji jiyana li Şamê diçe Almanyayê û heya sala 1999an li bajarê Frankfurtê bicî dibe. Di sala 1998an de romana Êvara Perwaneyê dinivîse. Ji sala 1999an ve li bajarê Kölnê rûdine.

Şêrzad Hesên, çîroknivîsê kurd yê navdar li ser Bextiyar Elî dibêje: “Heq e Bextiyar Elî xelata Nobel ya edebiyatê werbigire, lê bextreşiya wî ew e ku kurd e. Di nav kurdan de dijminên mirovên xwedî şiyar û talênt ji dostên wî zêdetir e.”(www.avestakitap.com)

Heta niha nêzî 20 pirtûkên wî hetiyê çapkirin. Bi helbestê destpêka wêjeyê kiriye lê belê em dikarin bêjin bi romanên xwe navdar bûye. Bextiyar Elî qeweta xwe ji romanê girtiye. Bextiyar Elî bêguman di wêjeya kurdî ya nûjen de ji aliyê mijar, ziman û honandinê romana kurdî aniye merhaleyêke nû. Em ji roportaj û meqaleyên wî aliyên wî yên ronakbîr û entelektuel fêhm dikin.

Xelata wêjeyê ya “Nelly Sachs” daxuyan kirin ku ew ê xelata sala 2018a li Elmanyayê bidin Bextiyar Elî. (basnews, 2018)

## **1.2. BERHEMÊN BEXTIYAR ELÎ**

-*Guneh û Karneval* (Helbest, 1992)

-*Mirina Tekanê Duyem* (Roman, 1997)

-*Êvara Perwaneyê* (Roman, 1998)

-*Tevahiya Berhemên Helbestan* (Helbest, 1983-1998)

-*Dawîtirîn Hinara Dinyayê* (Roman, 2002)

-*Bohemî û Stêrk* (Helbest)

-*Karkirin di Daristanên Firdewsê de* (Helbest)

-*Bersiv di serdema windabûna pirsiyarê de* (13 hevpeyvîn bi Bextiyar Elî re)

-*Îman û şervanên wê-hizra filozofî û derketinên wê yên nû di çanda kurdî de*

-*Xwênerê kujer* (Gotar)

-*Bajarê Muzîkvanên Spî* (Roman, 2006)

-*Heya şîniya gulan heya xwîna firîşteyan* (Tevahiya berhemên helbestan 1983-2004)

-*Xezelnivîs û Baxên Xeyal* (Roman, 2008)

-*Koşka Balindeyên Xemgîn* (Roman, 2009)

-*Apê min Cemşîd Xan ku herdem bayê ew bi xwe re dibir* (Roman, 2010)

# BEŞA DUYEM

## ANALÎZA ROMANÊ

### ***2.1. APÊ MIN CEMŞÎD XAN KU HERTIM BÊ EW LI BER XWE DIBIR***

Roman, li ser bingeha firîna Cemşîd Xan û serpêhatiyên wî pêk tê. Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir, ya Bextiyar Elî, bi hevoka “di destpêka sala 1979an de, gava Cemşîd Xan cara yekê hat girtin temenê wî hivdeh sal bûn” destpê dike. (Elî, 2015: 11). Cemşîd zilamekî çep e, komunîst e û ji aliyê be’siyan ve tê girtin û dikeve girtîgehê. Di girtîgehê de bêyî ku tiştekî li ber çav bidest xin işkenceyên zalim û tûnd pê dikin. Cemşîd xan berî girtina xwe lawikekî gilover û tijeye lê piştî kut ê girtin bi bandora işkenceyên ku her roj nûtir û tûndtir dibin ro bir o kêr dike û dibe lawikekî lewaz. Da ku ewqas ji zeîfbûna sivik dibe ku rojêke di guhestina girtîgehê de kes nizane bê bi çî awayî ba Cemşîd Xan difirîne û dibe. Dema ku Cemşîd Xan li ser ezmanan bû bi vê hevokê tê vegotin “tiştê ku di bîra Cemşîd de maye ew e ku pêşî hest bi gêjbûneke mezin dike, tirsekî mezin wî dagir dike, hest dike mîna pûş ba wî bi lezgînî dibe, di dîwarên zindanê bilindtir dike, di destpêkê de ba wî bi awayekî stûnî wî ber bi jor hildigre, dû re gava digihe raserî banên Desteya Ewlekariya Bakûr “ ku gerek e navê wî cihî be ku Cemşîd tê de dîl bûye”, bi awayekî asoyî wek mirov xwe li ser piştê dirêj kiribe ba wî pehn dike, hildigrîne; dixê ser dev, berbijêr dike û ber bi başûr pê re dileyîze.” (Elî, 2015: 13). Bextiyar Elî, bi taybetmendiya realîzma efsûnî ya dersirûştî van hevoka daniye. Bûyereke dûrî rasteqîniyê weke rasteqîn be nîşanî me daye. Di beşa yekem ya romanê rasteqîn û hêmanên dersirûştî bi hev re bi kar aniye.

Ba Cemşîd Xan li ser tamîrxaneyekê berdide û dikeve. Berdestek Cemşîd Xan dibîne. Cemşîd wextê ku dikeve û tê ser hişê xwe nayê bîra wî bê çiqasî li jor maye û çî bûye. Cemşîd Xan dere cem bavê xwe Hisam Xan û bûyera ku hatiye serê wî jê re vedibêje bavê wî werê difikire ku lawê wî yan dîwarên zindanê şikandibe û

reviyabe an jî dînbûbe. Cemşîd xan bi tîrsa ku cardin jialiyê be'siyan bê girtin xwe vedişêre. Dawîyê, biraziyên wî Salar Xan û Smayîl Xan bi gotina bavê wî Hisam Xan ji bo cardin ba wî nebe û parastina wî bikin dixwe xizmeta wî. Malbata Cemşîd wî dibin gundê xwe yê kevin e û li cihekî asê, din av çiyayan de ye. Ew der ji bo veşartinê cihekî ewle ye. Di romanê de bûyer him rasteîn û him jî fantastîkbin jî cîh û kes rasteqîn in. Cemşîd cara duyem li gundê Baranok difire. Di dawiya vê beşê dewleta Iraqê lêborînek dide kesên ku tohmetên siyasî li ser wan bûye.

## **2.2. BI CEMŞÎD XAN RE LI MEYDANÊN ŞER**

Beşa duyem ya romanê bi teslîmbûna Cemşîd Xan ya ewlekariyê dest pê dike. Teslîmbûna Cemşîd azadbûna wî bi destê wî naxe û wî dişînin leşkeriyê. Di vê navberê de şerê mezin a Îranê û Iraqê dest pê dike. Ne ji vî şerê mezin bûya Cemşîd ji ber lewazbûnê ew ê nebûya leşker lê belê kî dihat ber wan dikirin leşker û tevli arteşa xwe dikirin. Dema ku dihisin Cemşîd li ber bayê dere û qabiliyeta wî ya bi vî awayî heye biryar didin ku sûdê ji vê taybetmendiya wî bigrin ji bo hêza arteşê. Cemşîd din av arteşa Iraqê da navdar dibe wek ku nivîskar dibêje “ efsaneya kurdê baskdar” nav dide. Cemşîd dixwaze ku biraziyên wî Salar Xan û Smayîl Xan hevkarê wî bin. Daxwaziya wî tê cî. Cemşîd di cengê de difire bakûr û planê arteşa Îranê ji arteşa Iraqê re vedibêje û her carê bi saya wî serkeftineke mezin bi dest dixin. Şevêkê Cemşîd cardin difire û di xew re dere li ser ezmanan. Gava ku ro dertê arteşa îranê lê hay dibin û tekbrîran tînin. Cemşîd di firînek xwe de şirîtên ku braziyên wî Salar û Smayîl digirtin diqete û Cemşîd dikeve îranê. Salar Xan piştî ku apê xwe Cemşîd Xan wenda dike dev ji arteşê berdide û dere gundên Baranok û bi hêviya apê wî Cemşîd xan vegere benda wî dimîne.

Di romanê de du şaxên ku hevedemî de mezin dibin hene. Ji van her du şaxan ya xurt dikeve pêşiya din. Di vê beşa romanê de mijara firîna wî aliyê romanê ya efsûnî xurttir dike. Xwendevan dema ku dixwîne wek ku di hundurê çîrvanokekê de be hest dike.

### **2.3. XEFGEHÊN BARANOK**

Cemşîd Xan di beşa sêyem de bi rêwîtiyeke dirêj ya sê heftiyan berdewam kiriye gihiştîye Baranokê. Wek ku di pirtûka Haşim Ahmedzade dibêje “ Romanên Elî, bi têkileke zelal ya iyanitî û hêmanên fantastîk, alikariya aşînkirina bûyerên jê nayên bawerkirin û realîteyên civaka kurd dike. (Ahmedzade, 2015: 32) Elî, merev di bandora zimanê xwe yê herikbar û girêdana hêmanên fantastîk û rasteqîn de dihêle.

Li gundê Baranok tenê Cemşîd Xan, Salar Xan û lawikekî bi navê Erselan dimîne. Sal û nîvekê Cemşîd û Salar li gundê Baranokê xwe vedişêrin.

### **2.4. VEGERA LI BAJÊR**

Beşa romanê ya çarem bi vegera bajêr ya Cemşîd û biraziyên wî dest pê dike. Edî bajarên Bakûr azadbûye, şer qediyaye.

Cemşîd, di vê beşê de dil dikeve hevala biraziya xwe Xezal ya bi navê Safînaz. Piştî ku Cemşîd Xan dildar dibe ji bo heyraniya keçike bi dest xe cardin hêza firînê pê re çêdibe. Şevêkê bi firînê hezkirina xwe ji Safînaz re eyan dike. Safînaz di bandora hezkirin û taybetmendiya wî ya firîne de dimîne û pê re dizewice. Piştî zewaca xwe Safînaz dest bi diyarkirinên tiştên di jiyana Cemşîd de dike. Guhertineke wê jî ew bû ku Salar Xan û Smayîl Xan ji Cemşîd dûr dixê. Cemşîd ji hêza dildarbûna xwe yeka Safînaz Xan nake dudo. Şeveke Safînaz Xan diki ku Cemşîd di hewayeke bahoza xurt heye bifire. Wî qanî dike û bi diladarê xwe Îhsan Bayezîd hevkarîyê dike û dema Cemşîd li ser ezmanan dikeve şîrîtê diqetînin. Ba cardin Cemşîd Xan dibe wenda dike. Cemşîd saleke wenda dimîne. Di dawîya beşê de keçikek Salar Xan dibe cem Cemşîd ku Cemşîd li ber sekeratêbû.

Dema ku merev li romanê dixwîne merev dibîne ku rola sereke ya Cemşîd Xan e dû de jî lehengê xurt Salar Xan e. Lehengên din tev di roleke çilmisî de ne. Cemşîd Xan wek çavkaniya bûyeran e.

## 2.5. CEMŞÎD XAN Û XWEDÊ

Di vê beşê de bayê ku Cemşîd Xan biribû wî li nav çiyayên Bakûr, nêzî bingehê gerilayan wî datîne. Birîndar bûye û cardin tiştek nayê bîra wî. Gerila wî rehet dikin û dixwazin sûdê ji taybetmendîya wî ya firînê bigrin. Qederê salekê Cemşîd ji bo wan li ser ezmanan digere, nobedariya bingehên wan digre û çavderiyê dike. Cemşîd cardin ji ezmanan dikeve û vê carê ji xeynî peyva “Xwedê” tu peyv ji devê wî dernakeve. Cemşîd wextê vedigere mala xwe ji Salar Xan pêv kesî nasnake. Dû de herkesî nas dike. Cemşîd Xan vê carê xwezayêke weke ya derwêş û rebenan wergirtibû. Wek ku li ezmanan bi Xwedê re dipeyive û Xwedê dixwaze Cemşîd Xan weke mûcîzeyekê nîşan bide ji bo îrankirina mirovan. Lê ev rewş bi şîroveya Salar; her cara ku Cemşîd difiriya tiştên nexweş didît û dixwest li ezmanan rizgarkerekî peyda bike. Ev dîtina ku dibêje Xwedê dibîne jî lîstikeke hişê Cemşîd bû. Rojekê hinek komên ji alî olî hişkbûn êrîşî Cemşîd kirin û Cemşîd Xan birîndar bû. Ev bûyer kir ku ji welêt dûr bikeve. Wek gotina Salar ku dibêje “wan guleyan bandoreke wiha lê kir, ku Cemşîd heta hetayê Xwedê ji bîr bike.” (Elî, 2015: 79) bandorê lê kir.

Di romana Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir de jîbîrkin û sivikbûn du hêmayên herî bihêz in. Cemşîd Xan her cara ku difire û dikeve raboriya ji bîr dike lê bermayiyên wî pê re dimine.

## 2.6. RÊWITIYÊN CEMŞÎD XAN

Di vê beşê de Smayîl biryar dide ku tevî rêwîtiya apê xwe Cemşîd nebe. Lê belê Salar hemî emrê xwe bexşandibû apê xwe û her çibe çawa be ew dev ji apê xwe bernedida. Dikevin rêyeke ku ne dizanin derin ku û ew ê çî bikin jî. Piştî birîndarbûnê Cemşîd tenê behsa xeyala jiyaneke xweş û hêsan dikir. Salar Xan û Cemşîd Xan derbasî sînorê Tirkîyeyê dibin û li Stenbolê lawekî kurd bi navê Feysel re hev nas dikin. Li maleke lasşîroş a bi navê Mensûre Hanım bi Qerebîber re hev nas dikin. Qerebîber karê qeçaxçiyên ku mirovan derbasî Yewnenîstanê dikirin hêsan dikir. Cemşîd Xan û Salar Xan dest bi karê qeçaxçitiya mirovan dibirin ewropayê kirin. Cemşîd di vî karî de bi saya firîna xwe rêyên ewle didît û wan bi silametî digihand ewropayê. Di demeke kin de navdar bû lê rojekê cendirme wan digre Salar birîndar dibe, Cemşîd bê wî dibe. Salar deh salan li Baranokê li benda apê xwe

dimîne. Şeveke ji nişka ve ba Cemşîd davê nava deryayê. Lê belê Cemşîd wek qaxizakê li ser avê disekine. Di romanê de ji rewşan bêtir serpêhatiyên ecêb ên ku ji serê Cemşîd derbasdibe balê dikşîne. Lewra ji hevokên kin, zimanê xwerû û rojane pêk tên. Bandora balkêşbûnê û herikbariyê dikeve pêşiya cih, kes û rewşan. Bûna bûyerên sersirûştî xwendekar bi xwe girêdide û merev naxwaze pirtûk biqede.

Di dawiya vê beşê de bi alikariya masîgeran Cemşîd difire. Her cara ku difire li bajarekî dikeve; Malta, Qîbrîs, Grîtya û li Balkanan. Bi vî awayî li hemî neteweyan digere û dawiya dawî dixwaze vegere welatê xwe Kurdistanê.

## **2.7. AJANSA CEMŞÎD XAN**

Cemşîd vedigere welatê xwe û biryara nivîsîna pirtûkekê dide û braziyê wî yê ku bûye rojnamevan Smayîl pê alîkar dibe. Dawiyê biryara vekirina ajansê dide Cemşîd. Her ku diçû Salar wek xizmetkarekî didît û wî jî xebatên xwe yê ajansê dûr disekinand. Rojekê Salar dosyayeke wî kû li malê jibîr kiriye dixwîne. Fêma dike ku li ser tiştên xelkê yê nehênî dixebite. Cemşîd bi alikariya Smayîl difiriya û nehênîyên mirovan qeyd dikir. Ji bo di ajansê de belav neke ji wan mirovan peran distend.

## **2.8. DAWÎYA CEMŞÎD XAN**

Cemşîd û Smayîl şeveke ku cardin derin fermaneke nehênî û karên xwe yê şevê; du çekdar dema ku li ser ezmana ye êrîşî wan dikin. Smayîl di cî de jiyana xwe ji dest dide. Ba cardin Cemşîd dibe. Cemşîd dûrî bajêr dikeve mulkê Şasiver Begê Hicrî û bi taybetmendîya wî ya firînê dibe wek bûkeke lastîkî û jin û zarokên siyasethvanan kêfxweş dikir. Bi navê “Meymûnê Baskdar” herkes wî nas dike. Rojekê Salar Xan apê xwe Cemşîd tv’yê de dibîne. Dibîne ku di qefesê de ye û gulan dihejîne. Salar Xan wî xelas dike.

Cemşîd Xan di dawiya çîrokê de laşê wî hêdî hêdî giran dibe û dibe mirovek ji rêzê. Êdî, hev ditirse û spasiya xwe li biraziyê xwe Salar dike ji bo her çî ba braziyê wî he re hevkarîyê dikir û di emrê wî de bû.

## ENCAM

Di nirxandina vê romanê de em dibînin ku xeyal, rasteqîn û dersirûştî bi awayekî hostetî nivîskar tev hev kiriye. Ev rewş bi awayekî gelkî normal de nîşanî me bûye. Dema ku me çîrokê ku ji devê Salar Xan xwend wek ku em jî pê re dijiyan. Taybetmendîya realîzma efsûnî a melezbûnê bi serkeftineke mezin bikar aniye. Herwiha cih û war, leheng û wext ji jiyana rasteqîn honandiye.

Bi ziman û honandina romana Apê min Cemşîd xwendevan dixê bin sihra realîzma efsûnî. Ji bo merev tamê ji xwendina wî bistîne xwendevan pê re hevkarîyê dike. Bi zimanekî werê resen nivîsiye ku xwendevan di çîrokê de ji xwer cihekî dibîne û dinere ku ew cihê wî ye. Di xwendina romana Bextiyar Elî de him ramanên kûr him jî zimanekî bi aheng heye. Bextiyar Elî di romana xwe de bûyerên ku li Kurdistanê qewimiye bi qonaxan dihone. Zimanê Bextiyar Elî qasî ku janê hîskirin dide merev dikenîne jî bi hin bûyerên ecêb. Him jî zimanekî werê nerm û honandinek werê serkeftî bi hev re Bextiyar Elî di wêjeya kurdî ya nûjen de datîne cihekî taybet.

Nivîskar di berhema xwe de bi awayekî serkeftî dinyayên paralel çêdike ku yek ji van dinyaya fantastîk e û ya din jî rasteqîn e. Bi harmoniya fîzîkî û derûnî xwendevana derdixê rêwîtiyekê. Bextiyar Elî bi bikaranîna ramanên felsefî û rexnegirî hewl dide ku edebiyata kurdî hîn zêdetir nêzîkê nûbûnê bike.

Karakterên romanê him ji jiyana me bi xwe ne him jî derî jiyanê ne. Di romanê de du lehengên sereke û domdar Cemşîd Xan û Salar Xan in. Karakterên din giş em dikarin bêjin di roleke çîlmisî de ne. Bi asayîbûna xwe nêzî me ne, ji me ne; bi neasayîbûna xwe jî tiştên nebûyî diafirînin.

Di vê xebata xwe de jî me hewl da ku em romana ‘ Apê min Cemşîd xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir’ li gorî rêbazên realîzma efsûnî binirxînin. Me dît ku Bextiyar Elî, wêjeya kurdî aniye asteke bilindtir. Elî, hêmayên romanê li gorî rêbazên realîzma efsûnî neqîşandiye û bi zimanekî xwerû û herikbar pêşkeşî me kiriye. Bi vî awayî wêjeya kurdî nûtir bûye.

## ÇAVKANÎ

### Pirtûk

Bextiyar ELÎ, **Apê Min Cemşid Xan ku Hertim Bê Ew li ber Xwe Dibir**, Çapa duyem, Weşanên Avesta, 2011, İstanbul.

Haşim AHMEDZADE, **Romana Kurdî û Nasname**, wer. Fexriya Adsay, Çapa yekem, Weşanên Avesta, 2011, İstanbul.

ÖZSEVGİGEÇ, Yıldırım. “Büyülü Gerçekçi Kurgu Üzerine”, Uluslar arası Sosyal Araştırmalar Dergisi, cilt no:8, 190-192.

### Malper

<http://www.avestakitap.com/yazar.php?id=311>

<http://www.basnews.com/index.php/tr/culture-arts/376499>

<http://www.leblebitozu.com>



T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

**BEXTİYAR ELÎ’NİN *APÊ MIN CEMŞÎD XAN*  
*KU HERTIM BÊ EW LI BER XWE DIBIR*  
ADLI ROMANININ ANALİZİ**

Mariye YAŞAR BUDAK

13721170

Danışman

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin 2018